**Nivîskarê ku di pê xebata 20 salan re, ji tûrikê danehev û berhevkirina xwe 18 hezar biwêj deranîn û di ferhengekê de civandin. Belku cara pêşîn e ku di nava civata nivîskarên neteweyê kurd de nivîskarekî ev hejmara mezin ji bêwijan berhev kiribe û ew bi awayekî akademîk di pirtûkekê de rêz kiribin. Nivîskar û wergêr Dilawer Zeraq ku di sala 1965’an de li Farqîna Amedê ji dêya xwe bûye, di nîva salên 90’an de derbasî qada nivîskariyê bûye. Yekem berhevoka wî ya kurteçîrokan (Kakil) di sala 2002’yan de çap bûye. Ji xebatên berhevkirinê û nivîsîna bi zimanê kurdî wêdetir, Zeraq edîtoriya rojname û kovaran jî kiriye, her wiha çend berhem ji tirkî li kurdî wergerandine.**

**Beşa pêşîn ji vê hevpeyvîna ku Bûyerpressê bi nivîskar Dilawer Zeraq re kiriye, der barê danasîna biwêjan û veqetandina wan ji parçeyên din ên zargotinê de ye. Di beşa duyan de Zeraq rewşa kurteçîroka kurdî ya modern û hin babetên girêdayî wê dinirxîne. Ji ber ku Dilawer Zeraq teza xwe li jêr navnîşana “Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De” amade kiriye û weşandiye, me beşa sêyan a vê hevpeyvînê ji bo babetên Hawarê û rewşa kurdiyê di wê serdemê de veqetand.**

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtan

**- Em ê ji dergehê biwêjan derbasî hevpeyvîna xwe bibin. Ji ber ku ji her kurdekî zêdetir, tu yê bêhtir karibî ji pirsên evê hêmanê re bibî bersiv, dixwazim bipirsim: Tu çawa biwêjan pênase dikî?**

Biwêj, ew qalibên gotinan in ku hêman û dînamîkên herî girîng û bibandor ên zimanekî ne. Ji bo diyarkirin û têgihiştandina têgihan, bi mantiq û qalibên arizî yên wî zimanî hatine dîtin û afirandin. Her biwêjek, li gorî qalib û bikaranîna xwe xwedî çîrok, serpêhatî û qewamekê ye. Her wiha, biwêj, ji aliyê wate, dirûv, wesf û çawaniyê ve xweserî xwe ne; zêdetir ne di wateya ku pêşî tê fêmkirin, di wateyeke din, -wateya duyemîn a mecazî- de tên bikaranîn.

**- Ji tevahiya parçeyên zargotinê, dibe ku herî zêde di navbera biwêj û gotinên pêşiyan de nêzîkbûnek hebe. Gelo mirov çawa dikare biwêj û gotinên pêşiyan (pend) ji hev cuda bike û bizane kîjan biwêj e û kîjan gotin e?**

Rast e. Biwêj û gotinên pêşiyan ji gelek aliyan ve nêzî hev in. Lê belê, hin hêman û taybetî hene ku mirov dikare kêm zêde, yan jî bi rêjeyeke heta ji sedî not jî wan ji hev derxe û cihê bike. Bi çend mînakan:

a- Gotinên pêşiyan pend û şîret tê de hene, lê biwêjan ev taybetî nînin.

b- Gotinên pêşiyan gelek jê ji hevokên temamkirî pêk tên, lê biwêj dibe ku hevokek nîvçe be, hevoka şikestî be, yan jî ji du peyvan pêk hatibe û qet ne hevok be jî.

c-Gotinên pêşiyan xwedî hikmekî ne û nêrîn û darazê rasterast û aşkera dihewînin, lê belê biwêj, bi temamî li ser mecazê hatine danîn. Her wiha mecaz di hin gotinên pêşiyan de jî peyde dibe, lê hevokbûna wan an jî daraza aşkera û zelal dibe sedem ku ew nebin biwêj.

**- Ta çi radeyê pêwîstî bi bikaranîna biwêjan di nivîsên wêjeyî yên nûjen de heye?**

Pêwîstiya bikaranîna biwêjan, ne li ser nivîsên wêjeyî ye. Biwêj, di bikaranîna zimên bi xwe de pêwîstiyek e. Çi nivîsên wêjeyî, çi rojnamegerî, çi zanistî û çi jî cureyekî dîtir, her yekî di warekî de, di dîsîplînekê de pêwîstî bi ravekirinekê heye û ev ravekirina taybet jî pêwîstî bi biwêjan heye. Loma jî, heke em bi awayekî giştî bala xwe bidinê, biwêj, ziman bi xwe ye; her wiha hemû rê û awa û cureyên vegêran û vegotinên zimanî, di xwe de biwêjan dihewînin. Herçî nivîsên wêjeyî ne, ew jî bi heman awayî ne, yanî her wekî cure û dîsîplînên cihê, li gorî mijar, vegêran û divêtiya nivîsê pêwîstî bi bikaranîna biwêjan dibîne. Loma jî mirov nikare vê pêwîstiyê bi ast û derece û radeyan diyar bike.

**- Ji tevahiya parçeyên zargotinê, te biwêj berhev kirin. Sedemên hiblijartina te ji daneheva biwêjan re çi bûn û mekanîzma amadekirina “Ferhenga Biwêjan” bi çi awayî bû?**

Biwêjan, hema di destpêka nivîskariya min de giraniya xwe da nîşan. Di warê derbirînê de pêwîstiya min bi bikaranîna hin biwêjan çêdibû, an jî di vegêranê bi xwe de hin biwêjan xwe li min ferz dikirin da ku wan bi kar bînim. Û ji ber ku min dixwest zimanê vegêrana wêjeyî bi awayekî berfireh daynim, min pêwîstî bi awayekî dîtir ê vegotin (vegêran) û derbiranê didît. Yanî dikarim bêjim, serê pêşîn bo min pêwîstiyek bû ku ez gencîneya xwe ya biwêjan pirtir û zengîntir bikim. Ji ber vê hindê, min berhevkariya destpêkî bo xwe kir. Lê piştre, hay jê bûm ku biwêjên ku min berhev kirine, wekî hejmar û wekî naverok, gihiştine qewareya ferhengan. Loma jî, êdî min berhevkirina biwêjan, bo xwe kir xebateke dîtir a nivîskarî û ferhengsaziya xwe. Û wekî xebata dawî, min ferhenga biwêjan a zaravaya kurmanciya jorîn amade kir ku hejdeh hezar (18.000) biwêj tê de cî digirin.

**- Em ê ji biwêjan bibihurin û berê xwe bidin kurteçîrokê, lê em ê careke din xwe bisipêrin gencîneya zargotinê. Li gel hebûna mîrateke dewlemend ji çîrok û serpêhatiyên kurdî, kurteçîroka nûjen (modern) a kurdî gaveke ku layiqê evê mîratê be, avêtiye?**

Pirs du alî ye. Ji ber ku mîrata dewlemend a çîroka gelêrî digihîje hezar salan û mîrata çîroka modern -nivîskî- hêj sedsalî ye. Her wiha, heke em ji aliyê bingehbûna çîroka gelêrî ve bala xwe bidinê, em dikarin bêjin, belê ev bingehbûn têra xwe pêk hatiye. Ev bingehbûn, ji aliyê sazkirina zimanê çîrokê ve bes dibe sedem ku çîroknûsek, bêyî ku li ser gramera hişk bisekine û qaydeyên wê li xwe bike rêç û rêbaz, heke hay ji zimanê vegotinê (vegêranê) hebe, dikare li ser vî zimanê vegêranê çîrokan binivîse. Her wiha, çîroka modern qonaxeke dîtir e ku sazkarî û honaksaziyeke taybet jê re divê. Ev honaksazî ne wekî honakên çîroka gelêrî ye. Loma jî, ji gelek aliyan ve, qonaxa çîroka modern a kurdî ji mîrata çîroka gelêrî cuda ye û jê azad e. Têkiliya çîroka gelêrî û çîroka modern, bi giştî li ser ziman û çandê ye ku her ku diçe, bi saya jiyana bajarvanî a bilez ev têkilî jî ji hev dûr dibe û her yek li aliyekî dimîne. Û çîroka gelêrî dimîne bes wekî mîratekê. Heke pirs gavavêtina çîroka modern a bo layiqiya mîrata çîroka gelêrî ye, ez dikarim bêjim, ne hewce ye em li ser vê pirsê demê ji xwe bibin. Ji ber ku, êdî mesîleke dîtir a çîrokê heye ku wekî çîroka modern tê binavkirin, gelekî taybet e û ji gelek aliyan ve jî ji çîroka gelêrî û mîrata wê dûr e. Em dikarin bêjin, êdî her yek qedeke cuda û taybet e. Loma jî, heke pirs ev be; gelo çîroka modern a kurdî gaveke xurt bo pêşdeçûnê daye? Ez bo vê pirsê dikarim bêjim, bi qasî ku mirov karibe behsa gavên xurt bike, gavên avêtî hene û her wiha hin çîrokên nivîskî ên modern ên kurdî hene ku mirov dikare wan û çîrokên cîhanê bide ber hev (berawirdî hev bike).

**Gelek kesên ku helbestan dinivîsin, ne helbestkar in, lê helbestnûs in.**

**- Piraniya nivîskarên kurd ji berhevkirina folklor û zargotinê yan jî ji helbestê dest pê dikin, lê tu ji dergehê kurteçîrokê derbasî cîhana wêjeyê bûyî. Ji ber çi kurteçîrok?**

Bêyî ku ez kesekî têxim ber sûcdarî yan jî gunehkariyê, dikarim vê bêjim; gelek kesên ku helbestan dinivîsin û bi wê dest bi nivîskariyê dikin, dibêjin qey helbest bes ji nivîsîn û derbirana hestan pêk tê. Lê na, ne wisan e. Ev zanîneke şaş e. Belê hest di helbestê de hene, serwer in, lê belê ne bingeh in. Helbestkarî, hinekî jî avakarî ye. Her wekî nivîskariyê. Û bi ya min helbestkarî hinekî jî ji zikmakî ye (yanî ji jidayîkbûnê ye), jê pêvtir, gelek kesên ku helbestkar dinivîsin, ne helbestkar in, lê helbestnûs in. Ji ber hindê jî, ez ne helbestkar bûm ku min bi helbestê dest bi nivîsê bikira. Û digel wê jî, min hez dikir û dixwest hest û ramanên xwe, çîrokên ku jiyanê bi min û bi mirovên dîtir re ava dikin, bi awayekî berfireh, bi hevokên aşkera û neguvaştî derbibirim. Û ji ber van her du sedemên sereke, gava min nivîsî, min bi çîrokê yan jî bi kurteçîrokê dest pê kir.

**Ez Hawarê bi taybetî ji bo kurmanciya jorîn û ji bo Kurdistana Bakur wekî destpêka wêjeya modern didim nasîn û qebûl dikim.**

**- Di dabeşandina serdemên wêjeya kurdî de, tu Kovara Hawarê wekî destpêka wêjeya modern didî nasîn. Hawarê ev nûjenî afirand, an jî hebû û Hawarê geş kir û weşand?**

Min divê ez bêjim, ez Hawarê bi taybetî ji bo kurmanciya jorîn û ji bo Kurdistana Bakur wekî destpêka wêjeya modern didim nasîn û qebûl dikim. Belê, hin liv û parçeyên nûjenbûna wêjeya kurdî berî qonaxa Hawarê xuya dikin. Ew parçe û nîşane, di weşanên ku di serdema osmaniyan de û li Stenbolê derçûne, xuya dikin bi me ve. Di weşanên wekî Rojnameya Terakkî Teavûn a Kurd, Kovara Rojî Kurd, Kovara Hetawî Kurd, Kovara Jîn







**Geşkirina zimanekî, bi hevkariya qada siyasî û qada nivîskarî û pê re jî ya xwendewariyê pêk tê.**

**- Xwedîderkirtina kurdan li kurdiyê û geşbûna wê, girêdayî egerên siyasî û rewşê ye yan jî rêyine din ji bo vekirina evê girêkê (girêka paşguhkirinê) hene?**

Xwedîtîlêkirin û geşkirin, xwedî egerên cihê ne. Gava li dinyayê bes kesek bimîne ku bi zimanê kurdî diaxive û dinivîse, ew kes dîsan dikare heta mirina xwe xwedîtiyê li zimên bike; bi xwe bi xwe re be jî bi kurdî biaxive û ji bo xwe be jî bi kurdî binivîse. Xwedîtîlêkirin di bingeha xwe de armanc û daxwaza parastina bo xwe jî dihewîne. Lê belê geşbûn û geşkirin, girêdayî gelek kesan e. Geşbûn an jî geşkirin, kar û xebateke kolektîf û hevkariyê ye. Geşkirina zimanekî, bi hevkariya qada siyasî û qada nivîskarî û pê re jî ya xwendewariyê pêk tê. Loma jî, egera sereke ya geşkirinê, perwerdehiya bi zimanekî ye. Tu zimanek bes bi axaftinê geş nabe. Pêaxaftin mirina wî zimanî hinekî din jî dereng dixe. Lê wî zimanî rizgar û geş nake. Lê pênivîsîn û perwerdehiya bi zimanekî û pê re jî bikaranîna wî zimanî ya di qada medya û ragihandinê de, digel serdestiya siyasî, egerên sereke ne bo geşbûn û geşkirina zimanekî.

**Bi yek hevokê:**

**- Tu ji bo çi dinivîsî?**

- Bo birçîhiştina ruhê xwe yî zimanî.

**- Di geşta nivîskariya xwe de, tu li tiştekê poşman bûyî?**

- Na.

**- Gotina herî xweş ji bo te?**

- Xweş.

**- A herî ne xweş?**

- Nexweş.

**- Qehermanê te kî ye?**

- Tune.

**- Bi hevokekê xwe bibêje, tu kî yî?**

- Mirovekî xwedî dil.

**- Careke din sipas dikim. Gotina dawî?**

- Sipas bo te jî. Kurd mirovên xweşik in.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Serpêhatî

JANA TILIYÊ

Dildarê Mîdî

Hatiye gotin ku rojekê ji rojan, janeke (êş) dijwar li tiliyeke destê şêwirdarê mîr da, ta ku ew bi ser hev de guvaşt; hedar û qirara wî ji ber wê êşê nedihat, hal û wextê wî ji ber nebû .

Tevlî ku ew ciwanmêr li hember hemî cûreyên êş û nexwşî û tengasiyan bi aramî û deyaxa xwe hatibû nasîn jî, lê dibêjin wê şevê kir û nekir nikarîbû biçe dîwanxaneyê û li civata mîr rûne. Ne tenê wiha, lê belê xew jî bi çavên wî neket.

Rabû ji xwe re got: “Bavo ez çi ji mîr re bêjim! Eger ew sibe ji min bipirse û bêje çima şeva bûrî tu nehatî dîwanxaneyê, ku ez bêjim tilîka min têşiya, bi Xwedê ji min re pir şerm û kêmasî ye… Na na, ya baş ew e ku ez çavekî xwe biteqînim, eger wê çaxê ji min bipirse ez ê bêjim; ez benî bi Xwedê şeva bûrî êşeke dijwar li çavê min da û di encamê de çavê min teqiya; ji ber vê yekê min nikarîbû ez bême civatê. Dibe ku ev gotin baştir cihê xwe bigire.”

Rabû mêrikê şêwirdar çavekî xwe teqand, baş derman kir û girê da. Sibehê zû berê xwe da dîwanxaneyê. Dema ku şêwirdar derbas bû û rûnişt, di cî de mîr ji wî pirsî:

- Ha şêwirdar… çima şeva bûrî tu li civatê ne xuya bûyî, xêr bû, çi hebû?

Şêwirdar rabû ser xwe û got:

- Bi Xwedê mîrê min şeva bûrî êşeke dijwar kete çavê min û di encamê de çavê min teqiya, lewra min nikarîbû ez bême dîwanxaneyê.

Dibêjin dema ku şêwirdar çîroka xwe got, hema di cî de bû tiqe tiqa mîr -keniya- û got:

- Hey mala te çi nebe, ma gelo êşa çavan jî êş e! Weleh min digot qey tu yê bêjî êşê li tiliya min dabû û bi wê sedemê min nikarîbû ez bême dîwanxaneyê, ji ber ku kurdan ji berê ve gotiye: ”Jana tiliyê mîna derdê hewiyê.”

**Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.**

# Evîna Du Çiyayan

Ehmedê Huseynî

Di kuçeyên eşqê de, li parzemînên newêrek de, mîna ku qehremanê tirsê bim, mîna ku siwar û xweşmêrê têkçûn û şkestinê bim, ber bi meydana dilê te ve dihatim, ber bi çeperên qîrîna hestên te ve dihatim, ber bi alên te yên di sor de gevizî dihatim.

Di kêlîkên ku di nermika destên te de, mîna zûxurên bîranînan mezin dibûm û ji hilatina te têr nedibûm, ber bi berbanga reşgirêdayî ya kenê te ve û ber bi nimêja dawîn a tobedarên kirasê te ve dihatim.

Min dilê xwe yê bêlîs û yê bêbask, wekû sêwiyekî, wekû bêmiradekî, li pey xwe, li bin siya dara tûyê bi tenê hişt û min bi hezaran keserên riziyayî û xewnên beravêtî û mirinên bêwate, di zikê darê de veşartin…

Min helbesta bêhûdeyiyê bi destên xwe yên gunehbar dixeniqand, min peyvên sersom ji ser milên xwe yên birîndar diavêtin û min bi tenê tovê hawarekê di gewriya xwe de diçand, bi tenê min pirtûka qîrînê di xwîna xwe de av dida.

**Min pêjna lingên hevrêşimîn ên evînê dikir.**

Min ewrên spî yên dilê te tar û mar dikirin.

Min sirûd û awazên kenê te disipartin dîwarên ji camê, yên şevê disipartin şevçirayên keservedanên dayîkên reşgirêdayî yên Rojava.

Tu awirvedana bajarên bêçav bûyî.

Ez jî helkehelka şervanên Qamişlokê bûm.

Navê te ji axê dipijiqî û navê min di nav xwîna kesk de bê nav dima, navê te bi sira bayê re li ba dibû û navê min di toza Amûdê de, wekî ku dilê te be, dilerizî.

Ez payîza te me.

Ez çurisîna hemî rexên navê te me.

Ez deqa kulîka bejî li ser çermê destê te me.

Ez şûr im, qurban im, qublename me, qedîfeya sînga te me,

quling im, di evînê de, di kurtepista beybûn û binefşan de keççççê piling im!!!

Li qiblenameyekê digeriyam da ku berê xwe bidim êşa te, lê hemî aliyên eşqê bê alî, di serav û rewrewka xatirxwestinê de, diqîriyan..

Li sitranekê digeriyam da ku Evîna Du Çiyayan ji balindeyan re bibêjim,

ji berfê re, ji nehwirîna bayê kur re, ji Xwedawendên serjêkirî re...

lê min ji bilî kevirên poşmaniya te, dilê te yê di Çarçirayê de vêketî, lêvên tênahiyê yên çavkaniyên dadayî, nedidîtin.

Bêdengiyê ji nav destê dengvedanê birevîne û li xweşmêrên sirûdan, hema piçekî, ewle bibe!

Şîhîna hespên serberdayî, ji damarên min, ji gewriya xewnên min, ji sebeta tenhatiya min, derxîne!

Ewran ber bi qederên wan ve bajo! Min di himbêza xwe de haş bike û di guhê jiyanê de, Evîna Du Çiyayan, wek ku Mem Ararat negotibe, bibêje!

# UNESCO Temîniya Hînkirina bi Sê Zimanan li ser Bingeha Zimanê Dayîkê Dike

Şiyar Silêman

Zimanê mirov di destpêka jiyana xwe de bi şîrê dayîkê re hîn dibe, jê re tê gotin “zimanê dayîkê”, ji ber ku ew yekemîn alava peywendiya mirov bi derdorên wî re ye. Zanyarên derûnî girîngiyeke mezin didin wî zimanî; ji ber ew bingeha avakirina kesayetiya mirov e, bingeha ku jiyana wî tev li ser ava dibe, lewra divê ew avakirin durist be, da ku kesayetiya mirov ji ayindeyeke serkeftî re amade be .

Çima gelên cîhanê û rêxistinên navdewletî girîngiyeke mezin didin zimanê dayîkê?

Hebûna zimanê netewî mercekî sereke ji hebûna her neteweyî re ye, lewra hin kes li zimanê dayîkê dinerin ku ew tenê ji bo çesipandina nasnameya netewî ye, lê girîngiya zimanê dayîkê ji vê sedemê tenê mezintir e, lewra Rêxistina Navnetewî ya Perwerde û Zanist û Çandê UNESCO, sala 1999’an rojeke taybet ji zimanê dayîkê re destnîşan kir, tê de girîngiyeke taybet da hemî zimanên dayîkê li cîhanê.

UNESCO roja 21’ê Sibatê ji her salê wek Roja Zimanê Dayîkê terxan kir, wek rêzgirtinekê ji 11 şehîdên gelê bengalî re, yên ku di 21’ê sibata 1952’yan de li ser destê desthilata Pakistanê şehîd ketin, ew jî dema ku xwendekarên Bengladêş derketibûn xwepêşandanekê ji bo fermîkirina zimanê xwe yê bengalî. Ew bûyer bû sedema ku zimanê wan li kêleka zimanê urdu yê Pakistanê sala 1956’an bibe zimanekî fermî.

Hemî vekolînên zanistî tekez dikin ku hînkirina serkeftî ew e ya ku palê dide ser fêrbûna zimanên cuda li ser bingeha zimanê dayîkê, da civakên cîhanê gavên berfireh ber bi cîbicîkirina plana geşepêdana berdewam ta sala 2030’î ve biavêjin. Ew plan girîngiyê dide peydakirina derfetên hînbûnê ji hemî endamên civakê re sertaserî jiyana wan, ji bo bidestxistina zanînê, da karibin bi şêweyekî tekûz û berkeftî beşdariyê di jiyan û pêşdebirina civaka xwe de bikin.

UNESCO her dem civakên cîhanê han dide li ser hînkirina bi du zimanan, an bêtir ji duyan jî, li ser bingeha zimanê dayîkê, ji ber ev dibe faktereke girîng ji bo xweşkirina têkiliyên civakê û bilindkirina asta prosesa hîndariyê. Û ev plana rêxistina navdewletî temîniyê dike ku gerek hînkirin kêmanî bi sê zimanan be; ango zimanê yekemîn yê dayîkê be, yê diwemîn zimanê herêmî yan jî niştimanî be û yê sêyemîn zimanekî cîhanî be. Ji ber vekolîner tev gihiştine wê encamê ku xwendekarên ne inglîzîaxêv ên di destpêkê de hîndariya xwe bi zimanê dayîkê kirine, karîna wan a xwendina zimanê inglîzî bêhtir e ji wan kesên ku ji destpêkê de bi zimanê inglîzî tenê hîn bûne, ji ber hezkirina zarokan ji xwendinê re pirtir dibe dema bi zimanê xwe yê dayîkê dixwînin û ev hezkirina xwendinê xwe li zimanên din jî vedide.

Zanyarê zimanan Con Chomesky dibêje: “Programên hîndariyê yên hînkirinê ku bi zimanê dayîkê dest pê dikin û piştre zimanekî biyanî yê din fêr dikin, serkeftîbûna xwe li gelek welatên cîhanê diyar kiriye û encamine baş û erênî bi dest xistine, çi di warê derûnî yan civakî yan jî perwerdeyî de be, ji ber ew tirsa ji guherîna ziman li rex zarokan çênabe dema nû diçin dibistanê, bi kesayetiya xwe bawer dibin û hestê hebûna karîna akademîk li rex wan çêdibe û wê karînê di hînbûna zimanên din de bi kar tînin.”

Hin zanyarên din li gor vekolîneke sala 1988’an li ser erênî û nerêniyên zimanê biyanî di qonaxa seretayî de çêkirine, dibînin ku guncawtirîn pola hînbûna zimanê biyanî di sala çaremîn a qonaxa seretayî de ye, piştî ku şagirt hemî karînên xwe yên hînbûna zimanê dayîkê bi pêş de biribin.

Dema ku em rewşa gelê kurd li gor van teyorên zanistî yên zimanzanî bipîvin, em ê bibînin ku tevaya kurdan çi zarok çi mezin bin ziyaneke mezin gihaye wan, ji encama çewisandina li dijî me hatiye pêkanîn û dijatiya li hember zimanê me yê kurdî. Lewra xebateke berfireh û bêwestan ji her kesê kurd tê xwestin ji bo sivikirina bandora wan siyasetên gemar.

Li ser asta zarokan gerek e planine mukum û zanistî bên danîn, ji bo avakirina kesayetiya wan bi riya hînkirina zimanê dayîkê, her weha hînkirina zimanê niştimanî ku zimanê erebî ye li Kurdistana

Rojava û zimanê navnetewî ku îro zimanê inglîzî ye li cîhanê; bi riya hazirkirina mamosteyên xwedan karîn di warê perwerde û hînkirina bi zimanê dayîkê de, bi sûdewergirtina ji teknolojya û dabînkirina vîdyoyên waneyên tomarkirî ji bo dagirtina kêmaniya di kadroyên prosesa hîndariyê de, ji ber amadekirina mamostayan hewcedariya wê bi serbor û xebateke demdirêj heye, da em jî karibin hinek ji şert û mercên UNESCOyê bi cî bînin û gelê me jî bibe beşek ji programê wan ê geşepêdana berdewam ta sala 2030’î.

RÊZIMAN

# Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 5



Deham Ebdulfetah

Zimanê Pehlewî jî, weku zimanekî Îranî yê kevin, li rex zimanê Avistayî bandoreke fireh li hemû zimanên hawirdor, nemaze yên Îranî kiriye.

Li gora venerîna Mes’ûd Mihemed, ku di pirtûka “Zimanê Kurd” de dibêje, navê Pehlewî ji gotina “pertew” hatiye zîvirandin. Pertew jî navê Xurasanê yê kevin bû[1]. Vêca ku ev salix rast be jixwe em ê di wê baweriyê de bin ku zimanê Avistayî û yê Pehlewî, weku du darên şaxvedayî di yek xakê de şîn hatine û her zimanekî ji wan jî rola xwe ya serdestî li gora desthilatiya qûnaxê dîtiye..

Bi vê nêrînê em piştrast in ku bandor û kartêkirina van her du zimanan (ji hêla bêjeyan ve) li hev bûye û ya wan jî, li zimanên hawirdorê bi giştî û li yê Kurdî jî bi taybetî bûye.

Li gora xwendina Mes’ûd Mihemed, di pirtûka Perwîz Natil Xanlerî ya bi navê “Tarîxî Zebanî Farisî” de hatiye, zimanê Pehlewî li ser kavilên zimanê “Parsî” (Farisiya kevin) ava bûye. Ev ziman bi demê re bûye du beş:

1- Beşek li cihê xwe (Xurasanê) maye û bo ku ji beşê dîtir bê nasîn navê “Pelewanîk” lê bûye.

2- Beşê dî bi koçberiya Xurasaniyan re li herêma başûrê rojavayê Îranê belav bûye. Anku, li herêma Hewraman, belav bûye.

Zimanê Pehlewî desthilatiya xwe, bi şêweyekî fermî, ji destpêka serdema “Eşkanî” 250’yê BZ ta destpêka Islamê, li seranserê Îrana wê demê kiriye.

Ev jî bûye sedema ku ev ziman bandora xwe li hemû zimanên Îranî bike û zimanê Kurdî jî yek ji wan e, çiku zimanê Pehlewî ew qas dem li wê herêma Kurdî (Hewraman) bi kar hatiye û serdestiya xwe lê kiriye!

Ev malika jêrîn, ya ku Mes’ûd Mihemed ew ji pirtûka “Tarîxî Zebanî Farisî”, R. (249) hilçiniye û di pirtûka xwe “Zimanê Kurd” de bi cî kiriye, dê bandorê baş tekez dike:

- ” لَحْنِ أَوْرامَنْ و بَيْتِ پَهْلَوی زخَمهِء رودْ وَ سَماعِ خُسْرَوی ”

Anku, eger helbestên Pehlewî û awazên Hewramanî hev himbêz bikin ew ê hunereke pilebilind bijenin. Ji hêleke dî ve jî, ev malik bandora ziman û çanda Pehlewî li ziman û çanda Hewramanî (Kurdî) tekez dike.

Me berî nuha jî amaje pê kiribû, ku zimanê Kurdî bi hemû şêwezarên xwe ve, di himbêza zimanê Avistayî de bi ser lingan ketiye û di bin sîwana zimanê Pehlewî de jî demeke dirêj xwe dîtiye. Bandor û kartêkirina her du zimanên dêrîn (kevin), li hev bûye û ya her duyan jî li zimanê Kurdî bûye û lê diyar dibe, wekî ku di vê lîsteyê de berçav dibe:

| Avistayî | Pehlewî | Kurdî |
|---|---|---|
| - Wihurg | gurg | gurg û gur |
| - Dirac | diraj | dirêj |
| - Kirim | gerim | gerim |
| - Dise | deh | deh |
| - Deman | zevan | ziman |
| - Zime | dimistan | zivistan û zimistan |
| - Maweng | mas | mang û mah |
| - Wefir | wefil,wefir | berif, befir |
| - Xizik | …… | hişk |
| - Mirxe | miru | mir, mami |
| - …… | | |

Di reseniya zimanê Kurdî de gotina “mir” bi wateya “murx, teyr”, bi dû şêweyan teşeya xwe ya lêkdayî girtiye:

1- Mir + hîşk = mirhîşk (mirîşk) = murxê hişkayê.

2- Mir +aw, av = miraw (werdek) = murxê avê.

1-Ji “Tarîxî Zebanî Farisî” hatiye hilçinîn

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

# Çalakiyên “Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava” bi Dawî Bûn
# Çar Kes Hatin Xelatkirin û Çar Pirtûk dê Werin Çapkirin

**Bûyerpress - Taybet**

Sibeha roja înê (20.07.2018 \11’ê sibehê) Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê, dergehên “Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava” ku li Hola Zana ya bajarê Qamişloyê bû, vekirin.

Pêşangeha ku li jêr diruşma “Em bi Xwendinê Zindî Dibin” bû, bi tevlîbûna 25 sazî, dezgeh, weşanxane, kombûnên rewşenbîran û pirtûkaneyên deverê hat lidarxistin û bi qasî 6 rojan domiya.

Der barê hejmara pirtûkên pêşangehê de, di yekemîn roja pêşangehê de Endamê Komîteya Amadekar a Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava “Aram Elî” ji Bûyerpressê re got: “Pêşangeha pirtûkan a îsal 14 hezar pirtûkên têvel vedihewîne. Di roja duyan an jî roja sêyan de 3 hezar pirtûkên din jî dê bigihin pêşangehê, da ku hejmara giştî bibe 17 hezar pirtûk.”

Her çi qas hejmara herî mezin ji pirtûkên pêşangehê bi kurdî bûn, lê pirtûkên bi zimanên: erebî, ingilîzî, suryanî û tirkî jî li ser mase û refikên pêşangehê hebûn.

Pêşangeha pirtûkan ne tenê pirtûk, lê pêşangeheke wêneyên Yekîneyên Parastina Gel û Jinê (YPG\YPJ), pêşangeheke wêneyên Hêzên Asayîşê û pêşangeheke tabloyên Sandîkaya Jina Rewşenbîr li xwe digirtin.

Pêşangeha ku di 20’ê tîrmehê de li dar ket, êvara çarşemê (25.07.2018) bi xelatkirina çend kesayetan û biryardana çapkirina çar pirtûkan, bi dawî bû. Çalakiyên pêşangehê ne tenê îmzekirin û firotina pirtûkan bûn, lê di hundirê her rojekê de hejmarek ji çalakiyên cihê di pêşangehê de dihatin lidarxistin.

### Roj Yekê

Bi amadebûna hejmareke mezin ji kombûn û rêxistinên nivîskar û rewşenbîran, nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser û nivîskar û kesayetên serbixwse, Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava di sibeha 20’ê tîrmehê de hat vekirin. Di çalakiyên vekirina pêşangehê de, Hevserokê Meclisa Cîbicîkar li Herêma Cizîrê “Ebdulkerîm Sarûxna” axivî, di axaftina xwe de tevahiya kesên beşdar pîroz kirin û bal kişand ser salvegera şehîdbûna Ş.Herekol (Hisên Şawîş) ku ev pêşangeh bi xwe bi boneya şehîdbûna wî û “Şoreşa 19’ê Tîrmehê” di vê dîrokê de hatiye lidarxistin.

Ji aliyê xwe ve Hevseroka Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê “Bêrîvan Xalid” gotinek pêşkêş kir, di gotina xwe de pêşwaziya hemî kes û dezgehên beşdar kir û bernameya çalakiyên pêşangehê şîrove kir.

Piştî bidawîbûna axaftinan, êdî maseyên pirtûkan û pêşangehên wêne û tabloyan hatin vekirin û tevgera pêşangehê dest pê bû.

Di êvara heman rojê de, Sernivîskarên Kovara Sormeyê “Ebas Mûsa” û “Evdo Şêxo”, li jêr navnîşana “Şopandin û Dahûrandina Rewşa Çandî Li Herêmên Cizîr û Kobanîyê di Navbera Salên 2011-2016 de” semînarek pêşkêş kir. Semînara ku ji hêla Sernivîskarên Sormeyê ve hat dayîn, li ser encamên lêkolîneke Kovara Sormeyê bû ku ji berî aniha hatibû weşandin (Bi heman navnîşanê:”Şopandin û Dahûrandina Rewşa Çandî Li Herêmên Cizîr û Kobanîyê di Navbera Salên 2011-2016 de” hatibû weşandin). Di vê semînarê de asta guhpêdana bi xwendinê hat nirxandin, kêmasî û têbîniyên di tevgera xwendinê de hatin destnîşankirin û li ser babetên girêdayî pirtûkê û xwîneran pirsên beşdaran hatin bersivandin.

### Roja Duyan

Di çarçoveya çalakiyên “Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava” de, di roja duyan de (şemî \ 21’ê tîrmehê) li jêr navnîşana “Di Şer de Moralên Gel û Rola Ragihandinê” hevpeyvîna Maseya Girover hat lidarxistin. Di vê hevpeyvînê de, hejmarek ji ragihîner û rojnamevanên deverê li dor Maseya Girover li hev civiyan û rewşa Rojavayê Kurdistanê di 8 salên bihurî de û sitûbarî û xebatên ragihîneran hatin gotûbêjkirin. Ragihîner Leylan Cemal ku di hevpeyvîna Maseya Girover de beşdar bû, ji Bûyerpressê re da zanîn ku hevpeyvîna maseyê li ser çawanî û mekanîzma vegushastina nûçeyê û bipêşdebirina jêhatên ragihîneran bû.

Di êvara heman rojê de, li ser “Nivîskarên Kurd ên ku bi Erebî Nivîsîne” semînarek hat lidarxistin. Ev semînar ji hêla Mamosteyê Zanîngeha Rojava “Silêman Mehmûd” ve hat birêvbirin û dayîn, tê de li ser rola nivîskarên kurd di geskirina şaristaniya islamî de çend agahiyên dîrokî hatin rêzkirin û her du zanyarên kurd “Ibin Xelkan” û “Ebû Henîfa El-Dînewerî” wekî mînak hatin destnîşankirin.

Mamosteyê Zanîngeha Rojava “Silêman Mehmûd” der barê babeta evê semînarê de ji Bûyerpressê re got: “Di semînara xwe de min bal kişand ser gelek helbestvanên ku îro bi erebî dinivîsin û karîne tiştekî baş biafirînin; wekî:

Taha Xelîl, Hisên Hebeş, Luqman Mehmûd, Edîb Hesen û Munîr Xelef.”

### Roja Sêyan

Di çalakiyên roja sêyan de, pirtûka rojnameger û nivîskarê misirî Seyid Ebulfetah ya bi navê “مغامرة صحفي مصري في دولة داعش” (Serpêhatiya Rojnamegerekî Misirî di Dewleta DAIŞê de) hat îmzekirin. Nivîskarê misirî Seyid Ebdulfetah ku Serokê Navenda Qahîra ya Lêkolînên Kurdî ye, wek mêvanekî ji derveyî welêt tevlî pêşangehê bû. Ji serpêhatiyên geşta xwe ya li Rojavayê Kurdistanê ev pirtûk berhem daye û tê de li ser çeperên şer, hevdîtinên şervanan, rûniştina bi fermandarên Qendîlê re û tecrubeya Rêveberiya Xweser nivîsiye.

Hêja ye mirov bibêje ku çapa yekê ji vê pirtûkê li Misirê hatiye çapkirin û biryar e ku çapa duyan ji weşanên Desteya Çand Hunerê li Herêma Cizîrê derkeve.

Wekî her du rojên pêşîn, di roja sêyan de jî kombûnên nivîskaran, rêxistinên siyasî, kesayetên serbixwe û nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser ji tevahiya deverên Rojavayê Kurdistanê seredana pêşangehê kir.

### Roja Çaran

Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê, di çaremîn roja pêşangehê de li jêr navnîşana “Weger”ê hevpeyvînek li dor Maseya Girover li dar xist. Bi amadebûna hejmareke mezin ji wergêr û nivîskaran, hevpeyvîn ji aliyê Endama Komîteya Amadekar a Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava “Leylan Cemal” ve hat birêvebirin. Di evê hevpeyvînê de rewşa wergera kurdî - erebî li Rojavayê Kurdistanê hat nirxandin û li ser bandora wergerê di ragihandina kurdî de çend xal hatin gotûbêjkirin.

Kesên ku di hevpeyvînê de beşdar, bal kişand ser wê yekê ku pêwîstî bi hebûna dezgehine pispor di warê wergerê de heye, “da ku bikarin hemî celebên wêjeyê wergerînin.”

Berpirsa Ragihandinê di Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê de “Leylan Cemal” -ku hevpeyvîn ji aliyê wê ve dihat birêvebirin-, ji Bûyerpressê re got: “Me di hevpeyvîna Maseya Girover de ew yek nîqaş kir ka em ê çawa karibin berhemên cîhanî wergerînin kurdî û yên kurdî jî wergerînin zimanên din, bi mebesta ku em çand û wêjeya kurdî bidin nasîn.”

Cemal her wiha da zanîn: “Beşa duyan ji hevpeyvînê, li ser wergera ji erebî bo kurdî û bandora wê li ser ragihandina kurdî bû. Her wiha me bal kişand ser wê yekê ku em li gotinên xwe yên resen vegerin û ji têgehên nekurdî bi dûr bikevin.”

Her di roja çaran de, Ragihandina Hêzên Asyîşa Rojava, pêşangeheke taybet bi wêneyên asayîşê li dar xist. Di pêşangeha Hêzên Asayîşê de, wêneyên jiyan û xebata rojane ya endamên asayîşê hatibûn pêşandan.

Di heman rojê de, nivîskar Ronak Murad li jêr navnîşana “Di Wêjeya Şoreşgerî de Jin” semînarek da. Di semînara xwe de Murad giranî da cihê jinê di wêjeya Şoreşa Rûsî û Şoreşa Ceza’irî de û got ku di Şoreşa Kurdistanê de sitûn û hêmana sereke jin e.

### Roja Pêncan

Di pêncemîn roja pêşangehê de, Ragihandina Hêzên Asayîşa Rojava kurtefîlmek li ser rahênana Hêzên Asayîşê, Hêzên HAT û Hêzên Hawarî da pêşandan. Paşê li jêr navnîşana “Şano”yê, şanonivîs Beşîr Mela Newaf semînarek da. Di semînara xwe de Mela Newaf girîngiya şano û wêjeyê anî zimên û kurteyek ji dîroka şanoyê û destpêka wê ji beşdaran re xwend, her wiha bal kişand ser destpêka şanoya kurdî û avabûna wê li Rojavayê Kurdistanê.

Nivîskar Beşîr Mela Newaf di axaftineke xwe de ji Bûyerpressê re got: “Şanoya kurdî li Rojavayê Kurdistanê, tenê di çarçoveya cejnên neteweyî (Cejna Newrozê) de bû. Lê piştî ‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê’, êdî Rêveberiya Xweser festîvalên şanoyê li dar xistin. Tevlî vê yekê jî, lê careke din gelek astengî li pêş xebata şanoyê hene.”

### Roja Şeşan - Roja Dawî

Bi amdebûna nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser, kombûnên rewşenbîran û kesayetên serbixwe, çalakiyên “Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava” di roja şeşan de bi dawî bûn.

Bi boneya bidawîbûna çalakiyên pêşangehê, di hundirê hola pêşangehê de ahengek ji aliyê Orkestra Rojava ve hat lidarxistin. Di dawiya çalakiyên pêşangehê de, Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê her yek ji malbata Ş.Hisên Şawîş (Herekol), rojnameger Hoşeng Hesen, nivîskar Ebas Ismayîl û Navenda Şopdarên Rojê xelat kirin. Desteyê her wiha biryar da ku pirtûka “Şano” ya nivîskar Ciwanê Evdal, pirtûka “Rîwaya” ya nivîskar Mihemed Baqî Mihemed, pirtûka “Pendên Kurdî” ya nivîskar Mehfûz Mele Silêman û pirtûka “Xewatir” a nivîskar Lîlav Mustefa çap bike.

Di roja pêşangehê ya dawî de, Hevseroka Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê “Bêrîvan Xalid” ji Bûyerpressê re got: “Taybetmendiya ‘Duyemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava’ ew bû ku gelek weşanxane û nivîskarên derveyî Herêma Cizîrê lê beşdar bûn.”

Xalid her wiha da zanîn “di salên bê de, pêşangeha pirtûkan dê bi kelecaneke mezintir were lidarxistin.”

“Yekemîn Pêşangeha Pirtûkan a Rojava” di sala 2017’ê de hat lidarxistin û biryar e ku Desteya Çand û Hunerê li Herêma Cizîrê her sal evê pêşangehê li dar bixe.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

## Kultûrname

### ZIMANÊ KURDÎ Û ZANIST 1

**Zeynulabidîn Zinar**

Piştî destpêka vê hewldana bi navê "Çareseriya Pirsa Kurdî" ku ji aliyê hikûmeta Teyîb Erdoganî ve ketiye rojevê, di medyaya tirkî de jî geremolek seredor dibe ku ango "zanist û berhemên zanistiyê bi zimanê kurdî nayên nivîsandin..." Bi vê yekê jî ranawestin û dixwazin ku zimanê kurdî ji rûmeta wî ya sereke daxînin û kêmik bi xelkê bidin nasandin, dibêjin: "Zimanê kurdî, tenê di kuçe û kolanan de tê bikaranîn."

Pêşî ka em berê xwe bidin zimanên dinyayê, ka nasnameya zimanê kurdî li kurê cihê xwe girtiye:

Dema jiyana mirovan dest pê kiriye û demeke dirêj bihuriye, qalibê axaftinê jî di navbera mirovan de bi cihê bûye. Îcar her miletekî li gor çanda xwe, navek ji wê axaftinê re gotiye. Piştî demekê ew axaftina ku di nava mirovên wê demê de dibû, dabeşî ser heşt şaxan bûye. Ji her şaxekê re jî FAMÎLEYA ZIMÊN hatiye gotin. Ew heşt famîle ev in:

1- Famîleya Hindoewrûpî
2- Famîleya Koreyî
3- Famîleya Japonî
4- Famîleya Çînî
5- Famîleya Taylavî
6- Famîleya Semîtî
7- Famîleya Uralî
8- Famîleya Fîn-ogrî

Di famîleya Zimanê Hindoewrûpî de li dora 60 zimanên serbixwe hene, bi dehan jî zaravayên wê yên cuda hene. Zimanê kurdî jî, di nava vê famîleyê de cihê xwe girtiye. Kesên zimanzan, rind jî vê yekê dizanin.

Bê guman ziman ew pîrozî ye ku miletek pê his, daxwaz û vîna xwe eşkere dike. Zimanê kurdî, ew ziman e ku neteweyê kurd pê dipeyive. Kurdan jî wek hemû miletan, bi vî zimanî his, daxwaz, dîtin û ramanên xwe eşkere kirine.

Gelek rojhilatnas û zimanzanên biyanî, pejirandine ku zimanê Imperatoriya Madê, maka zimanê kurdiya îro bûye, weha gotine: "Êl û hozên Medan, di serê pêşî de bi yek zimanî peyivîne û alfabeyeke 36 tîpî bi kar anîne. Alfabeya wan jî, ji aliyê çepê ve dihate nivîsandin." Zimanê kurdî, dabeşî ser çar şaxên cuda bûye. Ji van şaxan re ZARAVA jî hatiye gotin. Ew çar şax ev in:

- Kurdiya Rojava
- Kurdiya Rojhilat
- Kurdiya Başûr
- Kurdiya Goranî

Çi zimanê ku îro li dinyayê heye û ku cihê xwe di nava van heşt famîleyên zimanan de girtiye, ew ziman dewlemend e û pê hemû şaxên zanistiyê jî hatine/têne nivîsandin. Lê helbet hinek ji hinekan dewlemendtir in.

## Serpêhatî

### Hemo û Elo

**Seydayê Tîrêj**

Hemo û Elo du birayên hev bûn. Hemo kurekî wî hebû; jê re digotin Zilfo. Zilfo kurekî kawik û nezan bû. Elo jî kurekî wî hebû; jê re digotin Mîrza. Mîrza xortekî hişyar û zana bû.

Hemo û Elo her du rojekê di nav civatê de ketin girê hev. Hemo got kurê min zana ye û Elo got kurê min zana ye.

Rabû her diwan a xwe kir yek û gotin em ê aniha her diwan biceribînin.

Elo şand dû kurê xwe Mîrza û jê re got:

- Mîrza li hespa xwe siwarê û here nav rez ji me re çend goşî tirî bîne.

Mîrza got:

- Ser çavan. Û berê xwe da mal.

Elo got:

- Mîrza çû mal, rahişt sirc li hespê kir, xurcik danî ser hesp, siwar bû, giha nav rez, hinek tirî çinî, kir xurcik; Mîrza siwar bû berî da mal, giha ber devê odê... rabin xurcik ji dest bigirin.

Yek ji civatê rabû, dît ku Mîrza li devê derî ye û xurcika tirî da dest wî.

Hemo jî şand dû kurê xwe Zilfo û jê re got:

- Kurê min li hespa xwe siwarê û here nav rez ji me re hinek tirî bîne.

Zilfo got:

- Babo ser çavan. Zilfo çû, bavê wî Hemo jî wek Elo got:

- Zilfo çû mal kêlîkê ma, sirc li hespê kir, siwar bû, giha nav rez, tirî çinî, kire xurcikê, xurcik li ser hespê danî; li hespê xwe siwar bû, berî da mal, giha gund, giha ber deriyê odê… yek rabe xurcikê ji dest bigire.

Yek rabû dît ku Zilfo li ber derê odê sekinî ye. Yê ku pê ve rabû jê pirsî:

- Ma ka tiriyê te?

Zilfo lê vegerand û got:

- Bi Xwedê kî tu yê ji bavê min re bêjî bê hefsarê hesp li kû ye?

**Her wekî Tîrêj gotiye:**

Li ber bayê wa zana guh bidêre
Ko cîza te bibî tev dur û gewher
Li ber bayê nezana ger bidêrî
Wê cîza te bibe xurdê êmê ker.

### Gotinên Pêşiyan

- Karê demekê çêtir e ji axaftina salekê.
- Barê giran tim li ker dikin.
- Hogirê kevin nabe neyar.
- Sêwîbûn ji dê ye, ne ji bavê ye.
- Mirov bi hişê xwe giran û sivik dibe.
- Qada bêxwedî, warê guran e.
- Zebeş bi dengê xwe hinar bi rengê xwe.
- Mêvanê xerab carekê nan dixwe.

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | | |
| 3 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 4 | | | | | | ■ | ■ | ■ | |
| 5 | ■ | | | | | | ■ | | |
| 6 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 7 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 8 | | | | | ■ | | | | |
| 9 | | ■ | | ■ | | | | | |

**Sitûnî**

1-Aheng, dawet - Logo, sembol, lafîte.
2- Çiyayekî Bakurê Kurdistanê.
3- Bajarekî Îranê - Nûh belavkirî.
4- Paytexta Senîgalê.
5- Malmezin, esilzade.
6- Bexşandin, lêborîn - Cejn - Bi lez.
7- Lêkera "zan" di dema borî de (yekijimar) - Bingeh, hîm.
8- Amûra kewîkirinê, kewî - Cejneke êzdiyan (nêzîkî navê "êzîdî" ye).
9- "Roman" bi erebî – Dijwateya "erê" (vajî).

**ASOYÎ**

1- Ne rast, çewt – Bavê hevjîna mirov.
2- Navê kok û hîma kurd, faris û hin gelên din - Keraset, felaket.
3- Hêrs, qehirî - Ne kevin - Cînavkeke kesane ya yekjimar (vajî).
4- "Vîn" bi erebî.
5- Serbestî, rizgarî - Cînavka xwedîtiyê di ingilîzî de (a min, ê min, ên min).
6- Benê ku cil pê tên dirûtin (vajî) – Nanê ku penîr di nav de ye û tê qelandin, germkirin.
7- Xwarina rojane – Hejmarek.
8- Next, birîna peyama hevjîniyê ji hêla melayî ve - Zaravayekî kurdî.
9- "Nivîsîn" bi soranî.

## Sitêrname 17

**Narîn Omer**

Ji hunermend Gulîstan pirsîn: "Eger tu li welat bimaya û koçber nebûya, gelo tu yê niha hunermend û konevan bayî, rewşa te dê çawa û bi çi awayî ba?"

Wê keserên dirêj berdan û got: "Ez bawer im ez ê kevaniya mala xwe û dayîka zarokan bûma. Dibe ku min karê konevaniyê bikira, lê helbet ez nedibûm hunermend û konevan; ji ber ku ez ji malbateke oldar û girtî me. Lê min ê bi aramî jiyana xwe derbas bikira."

Ji bersiva wê em dikarin tekez bikin ku karê konavaniyê û nerînên wê yên konevanî, ew derbasî warê huner û civakê kirine û ew di nava pêlên navdariyê de noq kirine.

Hunermenda me di sala 1962'yan de li bajarê Ruha yê Bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye. Temenê wê şeş sal bû dema ku malbata wê ji warê xwe koç kir û berê xwe da bajarê Wêran Şehrê. Hetanî ku temenê wê dibe 16 sal jiyana xwe li Wêran Şehrê didomîne, paşê berê xwe dide biyaniyê û li Swêdê bi cihe dibe, da ku jiyaneke nû bide destpêkirin.

Du tiştan jiyana wê bi carekê re guherand: Yek jê derbasbûna wê ji jiyana huner û konevaniyê re û ya duyan şûkirina wê bi hunermend Şivan re.

Girêdana wê bi hunermend Şivan re rêyên navdariyê di hemî aliyan de li pêş vekirin, nemaze dema ku wan bi hev re dest bi belavkirina kasetan kirin û aheng û konsert li dar xistin; di asîmanê hunera kurdî de bûn du sitêrk û hezkerên wan pir bûn. Jiyana wan çend salan bi hev re berdewam kir û kurê wan Serxwebûn jiyana wan geştir kir. Lê mixabin, ji nişkan ve hezkerên wan nûçeya berdana wan bihîst.

Helbet çend sedeman ew ji hev du dûr kirin, lê ez bawer im ciyawaziya nerînên wan ên konevanî sedema sereke bû. Cudabûna raman û nerînên wan ên siyasî, hêlîn û binemala wan xira kir.

Gulîstan dibêje:

"Min gavên xwe li ser xaka huner û dengbêjiyê weku hunermend û dengbêj neavêtine; belê weku konevan û xwedî nerîn. Ji ber ku gelê kurd di derfetên zor û dijwar de derbas dibû, me dixwest bi rêya sitran û muzîka xwe ji gel re nîşan bidin ku ew kurd e û divê ew berevaniyê di ber mafên xwe de bike. Ez dibînim tişta ku ez pê radibim serbixwebûn e."

Wê di televizyonên Med TV û Roj TV de bername peşkêş kirine û heta aniha jî di aheng û festîvalan de beşdar dibe.

Ji amûrên nûjen zêdetir, ew ji dahol, zirne, bilûr û erbaneyê hez dike, lê ew derbaskirina amûrên nûjen jî normal dibîne.

"Bingeha sitranbêjiya min gelêrî ye û min bi awazên folklorî û gelêrî, muzîka şoreşgerî çêkiriye. Ez hewil didim ku muzîka gelêrî ya ku ez pêşkêş dikim, bêhtir bi pêş bikeve. Ez bi hêvî me ku xebatkarên hunera kurdî hay ji awazan hebin û wan weku xwe bihêla, heta ku bi amorên nûjen bên sazkirin". Der barê hunera xwe de, hunermend Gulistan wisa gotiye.

Ew di sala 1985'an de derbasî hola sînemayê dibe û dibe lîstikvana fîlmekî. Lê weku pirani fîlmên kurdî, ew bi ser nakeve û projeya wê û hunermendên din naçe serî ku ew bingeha sînemaya kurdî bi awayên sazkar ava bikin.

Ew dibêje ku bandora hunermendên kurd ên navdar ên wekî: Meryem Xan, Eyşe Şan, Gulbihar, Nisrîn Şêrwan… li ser wê heye. Banga wê ew e ku nifşên nû sitranên van hunermendan (ên kevin) bibêjin û winda nekin, "lê pêwîst e ew navên wan jî bibêjin û li hember wan rêzdar bin."

Li ser koçberiyê dibêje:

"Koçberî hemî tiştan ji mirov disitîne û tiştekî nadiyê."

Hunermend Gulîstan bi tena xwe zêdetir ji heft kasetan û bi hunermend Şivan re du kaset berhem dane.

Di pêşkêşkirin û amadekirina bernameyan de ew hêj berdewam e û aniha karmenda kenala Rûdawê ye. Piştî bihurandina çend salan ji temenê xwe li Swêdê, êdî li Herêma Kurdistanê bi cih bûye û hetanî aniha hêj li wir e.

Em serkeftinê jê re dixwazin û hêvîdar in ku armancên xwe cî bi cî bike.

## Gulîstan… Bilûra Hunera Kurdî

### Peyva Windayî

**Da ku tu peyva windayî bibînî, peyvên jêrîn xêz bike:**

**ASÊGEH – BÊNDER – RÊBER – XWAZGÎNÎ – SERSAL – DÎNDAR – PÊJGEH – DEST – ŞERVAN – BAZAR – GABAR – BERFA SOR –KURTEÇÎROK – ZENGIL – KERPÎÇ – SORGUL – DA –DÛR – AHENG – BÊJING.**

**Peyva windayî ji 5 tîpan pêk tê, ew jî navê bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye.**

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| K | U | R | T | E | Ç | Î | R | O | K | D | A |
| B | Ê | N | D | E | R | Ê | R | Ê | B | E | R |
| D | Î | N | D | A | R | P | Ê | J | G | E | H |
| I | Ş | E | R | V | A | N | B | A | Z | A | R |
| A | S | Ê | G | E | H | B | Ê | J | I | N | G |
| G | A | B | A | R | R | Z | E | N | G | I | L |
| K | E | R | P | Î | Ç | S | O | R | G | U | L |
| X | W | A | Z | G | Î | N | Î | K | D | Û | R |
| S | E | R | S | A | L | D | A | H | E | N | G |
| B | E | R | F | A | S | O | R | D | E | S | T |

### Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | R | Z | A | N | ■ | O | D | E |
| 2 | R | Ê | ■ | V | ■ | O | L | A | N |
| 3 | A | B | O | R | Î | ■ | ■ | B | A |
| 4 | M | E | L | E | T | Î | ■ | A | Ş |
| 5 | ■ | R | ■ | Ş | A | B | A | Ş | ■ |
| 6 | A | ■ | L | Î | L | A | V | ■ | Q |
| 7 | R | D | A | N | Î | D | ■ | D | A |
| 8 | M | O | R | K | ■ | E | D | Î | B |
| 9 | E | T | A | ■ | Ê | T | Û | N | ■ |